

Bo nexweşên ku (Xarelto®, rivaroxaban) bo fibrilasyona guhikê bikar dînin

Fibrilasyona guhikê gengaze bibe sedema ginciyên xwînê li guhika dilî da.

Eger ev ginciyên xwînê serbest bin û bigihîşîne mêjî gengaze bibine sedema rawestana mêjî.

Xarelto pê bergirî kirin li çêbûna ginciyên xwînê, metirsîya meyîna xwînê û rawestana mêjî kêmtir dike. Ev belavoke şirove dike ka fibrilasyona guhikê çîye û çawa pê Xarelto tê çareser kirin û çî giringîya vê heye.

Sedemên fibrilasyona guhikê

Li fibrilasyona guhikê da, tepîna dilî bê pergala û hinek caran gelek tav lê dide ji ber ku girêya sinûsî ku lêxistina palsên elektrîkî ser guhika dilî kontrol dike, bi rewşek baş naxebite. Di rewşa asa da, guhika dilî biçûk dibe û her du malikên dilî pir li xwînê dike. Dema ku malikên dilî pirr dibin xwînê ji giş leşî re pumpaj dîkin. Ev mekanîzme bi giştî bipergala û kêrhatî ye, lê li fibrilasyona guhikê da, palsên elektrîkî li beşên cûda li guhikê da çê dibin û di encamê da dibine sedema biçûk bûna bêpergala û nekêrhatî ya dilî. Guhik nikare bi duristî tejiyê be yan vala be ji ber ku tûşî fibrilasyonê ye. Ev mijare dibe sedema bêpergalîyê di navbera guhik û malikê dilî da û dibe sedema ku bi bandor bûna malikên dilî bo pumpaja xwînê kêmtir be. Li encamê da gengaze ku pals hem lawaz bin û hem jî bêpergala û carna jî gelek lez bigewimin.

Nîşane

Nîşaneyên binav û deng yê fibrilasyona guhikê, dilkutan e û ahenga dilî ya bêpergala. Hinek kes mandî dibin, wîzeyake kêmtir hene û bê hêsanî bêhnê wan digire, tevî ku li hinek kesên di qet ev nîşane nayên dîtin.

Fibrilasyona guhikê liser Şirîta Dilî xûya dike

Bijîşk bo zelal kirina fibrilasyona guhikê Şirîta Dilî bikar tîne. Eger hûn tûşî fibrilasyona guhikê bûne, qeyd kirina Şirîta dilî ya 24 fêjimêrî yan 48 demjimêrî dikare ji zelal bûnê re alîkarî bike.

Sê tîpên fibrilasyona guhikê

Fibrilasyona guhikê bi pirranî girêdayî bi maweya dirêj bûna fibrilasyonê, ji 3 tîpan re tê parvekirin.

Fibrilasyona guhikê ya hêrîşker – maweyên kurt ku tenê çend xulekan dikişîne. Li hinek cara gengaze ev maweye çend rojan bikişîne û paşê dil dizivire ser ahenga xwe ya bi pergala ku jêr dibêjin ahengaa sinûsî.

Fibrilasyona guhikê ya berdewam – mawe bo zêdetir ji hefteyekê dirêj dibin û gengaze bixwe jêr biçin. Gengaze bo bidawî hatina ev kûrsane bikaranîna dermanî yan kardiyoversiyonê pêwîst be.

Fibrilasyona guhikê ya bênavber – fibrilasyona guhikê ku çareser nabe.

Dermanê fibrilasyona guhikê

Girêdayî bi giranî û maweya kêşeyê, tîpên cûda yê dermanî jî berdestin. Bi pirranî bo kêmkirina tepîna dilî û bergirî kirin ji destpê kirina kûrsên nû, derman pê berbestkera beta destpê dike.

Berbestkerên beta ev dermanin ku alîkarîya dilî dîkin ku pê lezek kêmtir û kêrhatî tir xwînê pumpaj bike. Carna berbestkera beta her bi tenê bese lê hertim ne wisa ne ku li ev rewşê da du bijarên herî berdest pêk tên ji:

Kardiyoversiyon – kardiyoversiyon pêk tê ji lêdana şokek elektrikal ji dilî bo vegerandina ahenga sînûsî. Pêwîstiya ev pêvajoyê maweyek kurt bêhiş bûne.

Derman – eger kardiyoversiyon nekêrhatî be yan bê encam be, gengaze li şûna vê antîaritmik bê bikar anîn. Antiaritmik ev dermanin ku alîkarîya dilî dikin bo bi pergala kirina dubare û parastina ahenga sînûsî.

Herduyê ev bijarên dermanî bo bergirî kirin li meyîna xwînê pêdivî hene bi bikar anîna dermanî. Fibrilasyona guhikê bi pirranî pêk tê ji dermanek nûjdarî yê bêdawî bo bergirî kirin li ginciyên xwînê û rawestana mêjî.

Fibrilasyona guhikê û madeyê dijî meyandinê

Fibrilasyona guhikê dibe sedem ku nexweş zêdetir bikevine ber metirsîya ginciyê xwînê û rawestana mêjî. Fibrilasyon xebata pumpaja dilî aloz dike ku bi ev wateyê ye ku xwîn pê bandorek kêmtir xwînê ji malikên dilî û guhika derbas bike. Dema ku heryana xwînê ji dilî tûşî kêşeyê dibe, metirsîya çêbûna ginciyê zêde dibe. Eger ginciyê xwînê yan beşek ji vê serbest be û pê geryana xwînê bikeve nava leşî, gengaze li mêjî da asteng bibe û bibe sedema rawestana mêjî. Dermana pê madeyên dijî ginciyê (ronîkerê xwînê) metirsîya çêbûna ginciyê xwînê bi rewşek berçav kêmtir dîke û di encamê da dibine sedema kêmtir bûna metirsîya rawestana mêjî.

Xarelto

Xarelto ji desteyek dermanê dijî meyîn, anku dermanê ronîkerê xwînê re dibêjin. Xarelto şêyana meyîn xwînê kêmtir dike û di encam da leşî lihember çêbûna ginciyên xwînê diparêze. Xarelto pê berbest kirina faktorek taybet li xwînê da dixebite – faktora meyîna Xa yê.

Xarelto dermanek pêşniyarkirî ye.

Dermana pê Xarelto

Maweya dermanî

Dermana pê Xarelto dibe heya dema ku metirsîya rawestana mêjî heye, berdewam be.

Bi pirranî derman pêwîste heta dawîya jîyanê. Nabe bê rabêja gel bijîşkê xwe bikar anîna Xarelto qut biken. Ji ber ku gengaze metirsîya çêbûna ginciyê xwînê zêdetir bibe.

Dibe Xarelto çawa bê bikar anîn

Xarelto her rojê carekê bikar bînin. Bixebitin ku hebê liser demjimêrek taybet di her rojê da bikar bînin daku hêsantir ev mijar li bîra we da bimîne.

Bêguman dibe Xarelto gel xwarinê bê bikar anîn daku parastina herî zêdetir gengaz be.

Xwarin û vexwarin

Hûn dikarin her tiştî bixwin; bikar anîna normal ya alkoholê ji bandorek xirab liser dermanî tune ye.

Eger li bîra we çû, hebekê bixwin

Bixebitin ku heba xwe li demek taybet li rojê da, meselen gel taştê yan şîwê bixwin. Eger doseke li bîra we çû, di ev rojê da hertim ku hate bîra we hebekê bixwin. Eger rojek tava we qet heb nexwarin, roja dî ligor pêvajoya berê û tenê hebekê li rojê da bikar bînin. Qet bo qerebû kirina hebe ku bîra we çûye, doza bikaranîna xwe du beramber neken.

Eger we gelek zêdetir Xarelto bikar anîye

Eger we gelek zêde heb bikar anîye, bilez gel bijîşkê xwe pêwendîyê bigirin. Eger we gelek zêde Xarelto bikar anîye, metirsîya xwînarîyê zêdetir dibe.

Bandorên kêlekê yê gengaz

Giş dermanan gengaze bandorê kêlekê hebin, tevî ku giş bikarîner nekevîne bin ev bandora ne. Eger hûn hay lê bûn ku hinek beşên lêşê we wek poz, dev, sazîya destava zirav yan sazîya xwarinê tûşî xwînarîyê bûne, bo rabêjê gel kilînkê xwe pêwendîyê bigirin. Eger hûn tûşî xwînarîyê bûn yan xwînarî nasekine, bilez daxwaza parastinê acil bikin. Herwisa eger we hest kir ku derbeyek giran gehîştîye made, sing yan ser we jî dibe bilez daxwaza parastinê acil bikin daku piştrast bin ku hûn tûşî xwînarîya hundirrî nebûne. Herwisa eger hûn gelek sistin, mandî ne, westîya ne, serêşîya we heye, sergêjiya we heye, bê hecet leşê we diwerime, bêhtengîya we heye, singê we dêşe yan tûşî janasîngî yê bûne, bi vê sedemê ku evane gengeze nîşaneyê xwînarîyê bin, bilez daxwaza parastinê acil bikin.

Aloz bûn gel dermanê dî

Dermanên dijî zerdavê wek Voltaren, Naproksen yan aspirinê bê rabêja bijîşk bikar neyîn. Dikarin hêminkerên ku têda paracetamol (asetaminofen) heye wekî Alvedon yan Panodil li gel Xarelto bikar bînin. Bêguman ji bijîşkê xwe re rabigehînin ku çî dermanên dî wekî dermanê bê nivîs û berhemên dermanî yê gîyayî bikar dînin. Bijîşkê we biryar digire ka kîjan derman ji were kêrhatî ye.

Sindordarî

Di mijarên jêr de pêş bikar anîna Xarelto gel bijîşkê xwe pêwendîyê bigirin:

- ◆ eger ji rîvaroksaban yan her madeyek dî Xarelto da, alerjî (hestiyarîya) we heye
- ◆ xwînarîya giran yan xwînarîya bênavber we heye
- ◆ we nexweşîya kezebê heye ku we dêxe ber metirsîya xwînarîyê
- ◆ hûn ducanî ne yan bin parastinê da ne

Herwisa eger we merema ducanîyê heye gel bijîşkê xwe rabêj bikin.

Xarelto pêş niştergerîya bijartî, biopsy yan xebatşn diransazîyê

Eger hûn dixwazin xebatê niştergerîya bijartî, biopsy yan xebatşn diransazîyê bikin, dibe gel bijîşkê xwe yan diransazê xwe pêwendîyê bigirin û agadar biken ku hûn Xarelto bikar dînin.

Taqî kirina bipergal ya xwînê ne pêwîste

Bandorên Xarelto li navbera kesan da gelek cûdahî tune ye. Xarelto dibe gel xwarinê bê bikar anîn daku misogerî bê kirin ku derman dikeve nava leşî, lê guhertinek taybet li melhezeya xwarinê da ne pêwîste. Ji ber vê bo taqî kirina bandora vê taqî kirina bipergal ya xwînê ne pêwîste. Pê bikar anîna Xarelto her rojê hûnê li hember ginciyên xwînê û di encamê da rawestana dilî bêne parastin.

Karta agahîyan ji bo ewlehîya we

Hûnê ji bijîşk yan perestarê xwe kartekê wer bigirin ku li ser agahîyên taybet bi derman kirina we pê Xarelto hatine qeyd kirin. Dibe hertim karta xwe li maweya serdanê ya derman bûnê ji alîyê bijîşkî, diransazî yan pêşkêş kerên dî yê parastina saxlemîyê ligel we be.

Qet pirsê we liser Xarelto hene?

Gel bijîşk yan perestarê xwe li kilînkê ku hûn têda derman dibin, bi axivin.

Bo agahîyên giştî, serdana belavoka pêvekirî biken.

Hûn dixwazin bi rêya peyamên nivîskî rojane bê bîra we bê bexist, ? li www.xarelto-patient.se da qey biken. Kerema xwe agadar bin ku ev xizmete li Swedê da çalak ke.

Xarelto (rivaroxaban), antitrombotiskt medel, **R** (B01 AF01). Tabletter 15 mg och 20 mg (F). **Indikation:** Förebyggande av stroke och systemisk embolism hos vuxna patienter med icke-valvulärt förmaksflimmer med en eller flera riskfaktorer, såsom hjärtsvikt, hypertoni, ålder ≥ 75 år, diabetes mellitus, tidigare stroke eller transitorisk ischemisk attack. **Dosering:** rekommenderad dos 20 mg en gång dagligen, vilket också är den rekommenderade maxdosen. För patienter med nedsatt njurfunktion (kreatininclearance 15–49 ml/min) är den rekommenderade dosen 15 mg en gång dagligen. Behandling med Xarelto kan initieras eller fortskräda hos patienter som kan behöva konvertering. Rekommenderad dos för patienter med icke-valvulärt förmaksflimmer som genomgår PCI (perkutan koronarintervention) med stentinsläggnings: Det finns begränsad erfarenhet om användning av reducerad dos, 15 mg Xarelto en gång dagligen (eller 10 mg Xarelto en gång dagligen för patienter med måttligt nedsatt njurfunktion [kreatininclearance 30–49 ml/min]) med tillägg av P2Y₁₂-hämmare i högst 12 månader till patienter med icke-valvulärt förmaksflimmer som behandlas med oral antikoagulation och som genomgår PCI med stentinsläggnings. **Kontraindikationer:** Aktiv, kliniskt signifikant blödning. Organskada eller tillstånd, som anses utgöra en

ökad risk för större blödning. Samtidig behandling med andra antikoagulantia. Lever-sjukdom förknippade med koagulopati och kliniskt relevant blödningsrisk inklusive cirrotiska patienter med Child Pugh B och C. Graviditet och amning. **Varningar och försiktighet:** Xarelto ska användas med försiktighet hos patienter med kreatininclearance 15–29 ml/min. Användning av Xarelto hos patienter med kreatininclearance < 15 ml/min rekommenderas inte. Om blödning inte kan kontrolleras kan antingen tillförsel av ett specifikt medel för reversering av faktor Xa-hämmare (andexanet alfa), som motverkar den farmakologiska effekten av rivaroxaban, eller ett specifikt prokoagulant medel, såsom protrombinkomplexkoncentrat (PCC), aktiverat protrombinkomplexkoncentrat (APCC) eller rekombinant faktor VIIa (r-FVIIa), övervägas. Datum för senaste översynen av produktresumén oktober 2019. Bayer AB. Box 606. 169 26 Solna. Tel. 08-580 223 00. För ytterligare information samt priser se www.fass.se. Före förskrivning vänligen läs produktresumén på fass.se.

▼ Detta läkemedel är föremål för utökad övervakning. Hälso- och sjukvårdspersonal uppmanas att rapportera varje misstänkt biverkning till Läkemedelsverket.

Översättningen är utförd av *TransPerfect Translations AB*, ett professionellt ISO 9001:2008-certifierat översättningsföretag med kompetens att översätta från engelska till kurdiska. Vi intygar härmed att denna översättning, enligt vår professionella kunskap, motsvarar dokumentet *Patientbroschyr (SPAF) på engelska*.

